# DÎHNÊN XWEZAYÊ YÊN HEEBUNÊ

# -2-

## «Mekana Źiyanê»

### Bi giśtî ti źîndarê ku bikare źi piśtî ku «cîgeha/mekana źiyana» wî hate tarumar yan źî tune kirin, xwa li źiyanê îspat bike, nîn e.

(08.08.2012, 20:20, Zürich)

Heebuna hemî źîndaran kîp bi derfetên heeyiyên «cîgeha źiyana» wan va girêdayî ye.
Her guhartina herî pićuk u mezin ya di nav vê «cîgeha źiyanê» da li ser hoyên źiyana źîndaran bandoreke heebe-nebe dike.
Źîndar bi mirinê ra ru b' ru dimînin. Yên ku digel îmkanên heeyî di nav vê dema ku pêwistî pê hee ye da xwa diguherînin u edepteyî hoyên «cîgeha nu» dibin/dikin, dikarin heebuna xwa îddîa bikin.

Di nav civakê da źî «cîgeha źiyanê» heman rolê dilîze.

Tirk, ereb u fars baś dizanin ku bi kuśtinan dawiya pêncî mîlyon kurdan hanîn, ne pêkan e. Źiber vê yekê ye ku bi hemî derfetên xwa yên heeyî «cîgeha źiyana kurdan» yek bi yek teng dikin, diguviśin, tarumar dikin, daku bikarin ćiśtên/elementên herî bingehîn yên ku «kurdbuniyê» pêk tînin, tune bikin.

Di vir da terora bi her hawî ya li «cîgeha źiyana kurdan» xwadî textîk u streteźiyeke herî sereke ye, ango kuśtina kurdan, vala- u talankirina pênc hezar gundên kurdan, nefîkirina pênc mîlyon kurdan, xerabkirina xwezaya Kurdistan'ê (bombebaranên li ser niśtegehan, avakirina bendavan, śewitandina daristanan ...), talankirina ekonomiya Kurdistan'ê, di nav baźarên kurdan u tirkan da bi darê zorê u bi meźburhiśtinê asîmîlekirina kurdan ya bi zman u kultura tirkan ...

Bêśik tunekirina «cîgeha zmanê kurdî» li vir derbeya herî berbat u kuźbar e li ser milletê kurd. Loma ye ku hemî hêzên diźber girîngiyeke bê pîvan didin tunebuna «cîgeha zmanê kurdî». Źixwa bi tarumar- u tunebuna bingeha «cîgeha zmanê kurdî», elementên kurdbunê źî pê ra yek bi yek handa dibin, lê li hêla din źî elementên tirk-, ereb- u farsbunê bi tevî zmanê tirkî, erebî u farsî yek bi yek di nav mêźiyên kurdan da śun dikin.
Źi vê śunbun u perisandinê pê va ti tevdîrên ku rê li ber tunebuna milletê kurd bigire, nîn e.

Digel van hegeran dîsan śerê li Kurdistan'ê, yanî śerê di nav «cîgeha źiyana zman u kultura milletê kurd» da, bi destê xwa kuśtina «zman, kultur u milletê» kurd e.
Ćênabe ku kurd diźminên xwa bi destê xwa dawetî «cîgeha źiyana xwa» bikin u bi destê xwa «cîgeha źiyana xwa» tarumar bikin, yan źî bidin tarumar kirin.
Di vir da yê ku kaarê dike, ew źî tenê tirk, ereb u fars in.

Loma źî ti śensa kesê ku di nav mala xwa da dest bi śêêr dike, nîn e.

Źibo ku meriv bikare l’ diźberên/beramberên xwa heebuna xwa bide qebul kirin, divêt bê him u gim «di nav cîgeha źiyana wan da», ango di nav malên wan da śerê xwa yê heebunê bike.
Śerê heebunê mafekî herî xwezayî ye ku heebuna xwezayê bi xwa kîp bi wê ra girêdayî ye.
Ango ćawan ku mafê tirk, ereb u farsan hee ye ku kurdan tune bikin, her husan mafê kurdan źî hee ye ku tirk, ereb u farsan tune bikin.
Tênegêśtina hoyên xwezayê yên heebun u nebunê, tenê tunebuna meriv bi xwa ra tîne.
Suc ne yê diźmin e, źiber ku ew karê xwa yê xwezayî dike.
Suc tenê u tenê yê kesê qurbanbuyî ye ku śertên mayîna li źiyanê fam nekiriye.

Ćênabe ku milletê kurd «cîgeha źiyana tunebunê» ya ku tirk, ereb u fars dixwazin bi zorê u zordariyê kurdan bixînin nav, qebul bikin.